

# Roja 20`ê Temûza sala 2019` an li bajarê Halle Saale

**Emê li hemberî grûpa  
naskirî bi „Tevgera  
Nasname“ derkevin!  
Ji bo hevbendiyeke bê sînor.**

*Grûpa „Tevgera Nasname“ wê roja 20`ê  
Temûza sala 2019`an li bajarê Halle Saale  
xwepêşandanekê ji bo rastgiran lidar bixe.  
Ji bo dijatiya wan jî wê xwepêşandan  
û meşên cuda bêne encamdan.*

**Emê çawan bikarin di vê derbarê de  
zanyariyên zêdetir bi dest bixînin.**

Zanyariyên ku heya niha di destên  
me de hene li ser rûpela Twitterê a  
[twitter.com/kurdisch\\_20\\_07](https://twitter.com/kurdisch_20_07)  
@kurdisch\_20\_07  
hene.

HASHTAG`a #Hal2007 di vê derbarê  
de bi kar bînin.

Li ser malpera [www.identitaere-stoppen.de](http://www.identitaere-stoppen.de)  
jî zanyarî bi zimanê Almanî hene.

Herwisa hûn dikarin di malpera  
[commonvoices.radiocorax.de](http://commonvoices.radiocorax.de) de zanyariyên  
bi gelek zimanan di vê derbarê de bibînin.

Bi şepêla 95.9 FM jî hûn dikarin Radio Corax



## **„Tevgera Nasname“ çi ye û çima meşên girseyî li hemberî wan têne encamdan?**

Bi navê „Tevgera Nasname“ (û herwisa nifşa Nasnameyê,  
bi kurtî Nasname û herwisa IB), gelek ji rastgirên  
tundrê, girûpên xwecihî li navxwey Almanya, li welatên  
din ên Ewropayê û herwisa li Dewletên Yekbûyî ên  
Amerîkayê derdikevin holê. „Tevgera Nasname“ ciwan  
û akademîsyenan lixwe digire. Herwisa weke nûnerên  
din ên „Rastgirên Nû“, hizrên xwe ên dijî demokrasî,  
rastgirî, li dijî sehyonîstan û herwisa fikrên xwe ên  
nejadperestiyê vedişêrin. Li gor gotina wan, nasname û  
çanda xwecihî a Ewropayê berî her tiştî ji aliyê Îslamê ve  
rastî gef û metirsiyan tê.

Li navenda propagandeyê a „Tevgera Nasname“,  
sloganeke mezin bi navê „Lihevguhertina Mezin“ tê  
dîtin. Ew tê vê wateyê ku amora penaberiyê, heşîmeta  
Ewropayê tevlihev dike û ewê bibe heşîmeteke ne  
Ewropî. Ev fikr, dikarin weke „Nejadperestiya Bê Nejadên  
Din“ werin binavkirin.

Ji sala 2017`an ve navendeke rastgirên tundrê li bajarê  
Halle Saale heye ku navê wê „Nasname“ ye û cihê wê  
jî li Adam-Kuckhoff-Straße 16 ye. Ji wê demê ve ku ew  
ji bo cara yekê li wî bajarî bi awayekî fermî derketin  
holê, wan gelek kiryarên tundrê encam dane. Di warên  
raman û kesatiyê de pêwendiyek di navbera wan bi  
wan terorîstên rastgir re heye ku li Niyozîlandê kiryarên  
terorîstî pêk anîn û bi manîfêst û hizrên xwe, weke  
„Rastgirên Nû“ têne nasandin. Ew teror û tawan, heman  
bicîkirina hizrên Rastgirên Nû ye. „Tevgera Nasname“  
sala 2017`an bi gemiyekê bi navê „C-Star“ hewl da rê  
nede êdî li deryaya Îjê alîkariya penaberan bê kirin û  
ew kes bêne xeramekirin. Bandoreke zêde a rastgirên  
tundrê di siyasetê de heye. Ew êdî li herêmên cuda  
û li navçeyên Ewropayê di nav dewletan de berfireh  
bûne. Betalkirina girêbestan, diwarkirina çûnûhatinan  
li sînorên Ewropayê û bînpêkirina mafên bingehîn ên  
penaberan jî di encama wan gotûbêjan de bûn ku ji  
aliyê rastgiran ve dihatin rêvebirin. „Tevgera Nasname“ ji

bo roja 20`ê meha Temûzê a sala 2019`an gelek xelkê ji navçeyên cuda ên Almanya bi kar tîne û slogana wan jî ev e: „Ewropayê biparêzin! Evder axa me ye.“

## **Wê di vê rojê de çi biqewme? Kî xwepêşandanên li dijî van grûpan rêk dixe.**

Emê li hemberî grûpa naskirî bi „Tevgera Nasname“ derkevin! Ji bo hevbendiyêke bê sînor.

Navendek bi navê „Halle li hemberî Rastgiran“ dixwaze ji bo pêkanîna hevdendiyêke bê sînor dakeve kolanan û li hemberî „Tevgera Nasname“ derkeve. Armanca me ev e ku tevî wan kesan bibin ku dixwazin li Almanya û welatên din ên Ewropayê li hemberî bînpêkariya mafên mirovan û herwisa ji bo xetimandina mirina mirovan li deryaya Îjê şer û têkoşinê dikin. Ev kes, bi rengekî aştîyane dixwazin bi çalakîyên cuda, xwepêşandanên hevgirtî pêk bînin. Werin em hemû bi hev re di roja 20`ê Temûzê de li hemberî „Tevgera Nasname“ bibin astengî û bibin nûnerê hevbendiyêke bê sînor!

## **Çi? Kengî? Li kuderê?**

Ev zanyarî bi giştî mercdar in. Plan û rê dikarin bêne guhertin.

„Tevgera Nasname“ Bahnhofa navendî a bajarê Halle weke cihê hevdîtin û hevgihîştina xwe destnîşan kiriye û biryar e demjimêr 12`an li wir bin. Ji wir meşeke rastgiran wê pêk bê û derbasî navçeyên navenda bajar bibe. Dibe ku mirovên bi hizrên nêzîkî wan yan jî grûpên bi vî rengî wêren Bahnhofê. Ji xeynî vê „Tevgera Nasname“ dixwaze demjimêr 4`ê êvarî, cejnê li ser kolanan pêk bîne û wê li pêşberî navenda wan li Adam-Kuckhoff-Straße 16 bê lidarxistin.

Demjimêr 12`an wê hin xwepêşandan li hemberî wan li Bahnhof, Campus Steintor, Riebeck Platz û hin cihên din bêne lidarxistin. Tevahiya van xwepêşandan û meşan, fermî ne û li cem navendên ewlehî hatine tomakirin. Ew kesên ku bixwazin, dikarin tevî xwepêşandan bibin. Werin û bi me re bin!

Roja 20`ê Temûzê wê gelek polîs li nava bajar çavdêriya rewşê bikin da ku xelk nekare li nava bajar bi rengekî serbest çûnûhatinê bike.

## **Çi bikim eger pirsgirêkek çê bû? Gelo divê bitirsim?**

Vê rojê bi tenê dernekevin. Bi taybetî dema ku hûn diçin Bahnhofê û derdorên wê, bila herî kêmkê kesek bi we re hebe.

Haya we ji hev hebe! Di derbarê vê rojê de agehdariyê bidin hevalên xwe jî!

Eger hûn şahîd yan jî qurbanîyê êrişêke rastgiran in, kesên din jî haydar bikin da ku piştewaniya we bikin.

Pişt re dikarin di derbarê vê tawanê de bi navenda şewirmendiyê a bi navê Mobile Opferberatung re bikevin pêwendiyê.

Cihê vê navendê li vir e: Platanenstr. 9 / 06114 Halle

Hejmarên telefûnan: 0345 / 2267100 / Mobil: 0170 / 2948413, 0151 / 53318824 û 0175 / 1622712

Whatsapp: 01512 / 2238538

Eger polîs jî we aciz bikin yan guh nedin we, hûn dikarin bi navenda serbixwe a lêkolînê re bikevin pêwendiyê ku navê wê EA ye.

Hejmara telefûnê wê pişt re bê ragihandin.



Eine Kampagne von:



Gefördert durch:

Hallianz für Vielfalt – Partnerschaft für Demokratie Halle

